Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :420 nameronahi@gmail.com 25- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Peymana Kurdistan kir 4 parçe: Lozan

Faruq SAKIK

Qesra Uşî. Uşî li quntarê Çiyayê Alp, li welatê Swîsre ye. Ev qesra ku li kêleka Gola Lemanê yê, ji şowalyayên sedsala 13an maye. Ev avahiya ku bi sedan salan ji şervanên remza mêrxasiyê re malbendî kiriye, di salên xwe yên dawîn de, dîplomat û siyasetmedarên ku şowalyeyên xwedî şeref xistine nav fediyê jî hewandiye. Belê, di vê qesrê de rihê şowalyeyên mêrxas û rihê netew û welatên ku di bin baniya vê avahiyê de hatine perçekirin bihevre diqîrin û li bêbextiya demên modern lanetê dikin.

Piştî îmzekirina peymanê, heyeta Tirk dema ji Qesra Uşî derdiketin, Îsmet Înonu bi kêfxweşî cigaraya xwe dikişand. Li pey xwe Kurdistanek ku hatî 4 parçekirin hiştî. Dikene…ku Kurd çawa xapandiye û çawa bi serketiye.

Di 24ê Tîrmeha 1923an de li LOZANê ev manzere hebûn.

## PÊVAJOYA VÊ PEYMANÊ, BI ŞERÊ YEKEM Ê CÎHANÊ DESTPÊ DIKIR

Di Şerê Cihanê yê Yekem de



du blokên mezin, Bloka Antant yanê Brîtanya, Fransa, Îtalya û Rûsya û Bloka hevpeyman yanê Almanya, Tirkiye û Awistirya, bihevketibûn.

Di encama şerê ku çar salan ajot de, Brîtanî û hevalbendên wan biserketin û împaratoriyên mezin ên wek Osmanî, Alman-Awistirya û Rûsya têk çûn û ji holê rabûn. Li ser xaka van imparatoriyên têkçûyî dewletên nû peydabûbûn.

Li Rûsya imparatoriyek nû, dewletek îdolojîk ku ji Rusyaya kevn mezintirbû derketibû holê.

Li Almanya û Awisturya jî dewletên netewî hatibûn damezrandin.

Xaka Osmanî jî ji hev belav bûbû û ji bilî Kurdan hemû netewên din ji împaratoriyê veqetiyabûn. Li ser mîrata mayî jî di bin serokatiya Mistefa Kemal de komarekî hatibû sazkirin.

Lê gelek pirs û pirsgirêk hêjî dewam dikirin. Kurdistan di navbera Tirk, Brîtanî, Frensî û Farisan de mabû.

Di navbera Komara Tirk û cîranan wê û Brîtaniyan de jî gelek nakokî mabûn. Brîtanya li Rojhilata Navîn li pey dengeyên nû bû. Ji bo wan an perçekirina xaka Osmanî an jî dostaniya Komara Kemalîst lazim bû. Ji ber vê yekê diviyabû ew lihev rûniştana û nakokî û pirsgirêkên xwe çareser bikirana.

## PEYMANA SAYKES-PICOT

Di destpêka şerê cihanê ê yekê de,di sala 1916an li gor biryarên peymana Saykes-Picot dewletê Antant li ser parvekirina dewleta Osmanî li hev kirin.

Encamên vê siyasetê bûn sedemên di konferansa li San-Remo yê ya 19 û 26ê Nîsanê de, Kurdistan di navbera tirk, ingilîz û frensiyan de bê parve kirin.

Şertên wê, çend bajarên Anadoliyê ne tê de, temamê herêmên dewleta Osmanî dixist bin nifûza dewletên Antant. Di vê demê de hikûmeta Osmanî di têkîliyên navnetewî û ên hindûrî de gelekî qels bû.

Şertên peymana Sewrê gelekî elastîk hatibûn hazir kirin. Ew ji bo bazarek di dema pêş de hatibûn hazir kirin. Bi taybetî xalên derheqê pirsgirêka kurd bi hin egeran ve hatibûn girêdan.

Peymana Sewrê ku naveroka wê di 24ê Nîsana 1920an de di Konferansa San Remo de hatibû amadekirin di 11 Gûlana 1920an de ji bo lêkolînê şandin Hikumeta Osmaniyan.

Tirk jî wek dewletek di şer de şikestî, mecbûr bû ku li gor şertên dewletê Antant peymanekê imze bike.

Piştî hin nîqaşan dewleta Osmanî neçar ma ku vê Peymanê bipejirîne.

Ew peymana Sewrê di 10ê Tebaxa sala 1920 de li nêzikî Parîsê li bajaroka Sewrê di nav hikûmetên Antant û Tirkiyê de hat imze kirin.

Di vê peymana ku bêxwedî mabû de hin mafên netewî yên Kurd û Ermeniyan hatibû naskirin. Li gor Peymana Sewrê li ser xaka Împaratoriya Osmanî dewletên Kurdistan û Ermenistanê dihatin damezrandin.

Bendên Peymana Sewrê yên 62, 63 û 64an, damezrandina Kurdistaneke serbixwe destnîşan dikirin.

## BER BI LOZANÊ VE

Ji bo têkbirina peymana Sewrê û amadekariyên konferanseke nû Tirkiyê û dewletên Antant dest bi pêwendiyên dîplomatîk ên nû kirin.

Rewşa siyasî ya herêmê hedî hedî ber bi zelalbûnê diçû. Nakokiyên Tirkiyê û dewletên Antant kêm dibûn û înteresên wan ên dabeş ew mecbûr dikirin ku dest bi pêwendiyên dîplomatîk bikin. Li ser vî esasî Tirkiyê, İngilîz, Frensa û Îtalya dest bi guftûgoyan kirin.

Di dema konferansa Londonê ya 1921 de şertên peymana Sewrê sivik kirin.

Pirsgirêka yekê, têkbirina biryarên peymana Sewrê bûn, ango redkirina mafê Kurdan bû, ya duyem jî guhertina rejîma tengavan bû.

Kemalîstan ji nakokiyên siyasî ên navnetewî û bi taybetî jî, ji nakokiyên dewletên Antant û Sowyet'ê fêdek baş dîtin.

Di rewşa kemalîstan de jî her diçû pêşketinin mezin çêdibûn. Li Enqerê Meclîs hatibû damezirandin.

Meclîsa Tirk roja 18ê Cotmehê ji bo sazkirina heyeta Lozanê cîvîna yekem bi dizî lidarxistibû. Ji bo Kemalîstan naveroka vê heyetê gelek girîng bû. Lazim bû endam û serokê heyetê ji gotina Mistefa Kemal derneketa.

Di 4ê Mijdara sala 1922an de li Meclîsa Tirk li ser amadekariyên Peymana Lozanê rûniştin pêk dihatin.

Di serî de Mebûsê Bedlîsê Yûsif Ziya gelek mebûsên Kurd di vê rûniştinê de, ji heyeta Tirk duxwestin ku di hevdîtinên Lozanê de ew ti carî qebûl nekin ku Rojava û Başûrê Kurdistanê ji Tirkiyê bê veqetandin. Lewra ew xaka Kurdan e û Kurd û Tirk jî bira û xwedî heman qederê ne.

Herwiha di axaftin û nîqaşên demê de yekitiya Tirk û Kurdan jî derdiket pêş. Di termînolojiya demê ya fermî de bi hêsanî behsa Kurdan û Kurdistanê dihat kirin.

Heyeta Tirk ya Lozanê bi giştî ji 38 kesan pêk dihat.

Di nav 21 şêwirmendê heyetê de mebûsê Amedê Zülfî Tigrel jî hebû. Zilfî Tigrel ji alî rejimê ve ji bo Awrûpiyan wek delegê Kurdistanê hatibû nîşandan. Qaşo delegê Kurdistanê Zilfî Tigrel, dema hevdîtin, niqaş û îmzekirinên ser mijarên ku Kurdan eleqedar dikir de nexweş diket û nedihat cihê hevdîtinan.

## CIVÎNA DESTPÊKÊ

Konferansa Lozanê di 20ê Cotmeha1922an de dest bi civîna yekem kir.




Dewletên ku tevlî Konferansa Lozanê bûbûn ev bûn: Brîtanya, Fransa, İtalya, Türkiye, Yûnanîstan, Yugoslawya û Japonya. Yekitiya Sowyetê, Romanya û Bûlgaristan jî tevlî rûniştinên li ser pirsgirêka tengavan dibûn. Herwiha Dewletên Yekbûyî yên Amerîka jî wek çavder tevlî konferansê dibû.

Di konferansê de zimanên Frensî, İngîlîzî û İtalî dihat axaftin. Dewletên Rojava navê konferansê danîbûn; ''Konferansa Lozanê ya Karên Rojhilat.'' Hevdîtinên Lozanê 2 meh û nîv dewamkirin.

Dewletên hevpeyman, ji bo muzekereyan gazi tirkiye kirin. Di 23'yê Nisana 1923an de heyeta tirkiye cara duyem çû Lozane.



Îsmet Înonu cardina ji vê heyetê re serokatî dikir. Li ser her tiştî li hevkiribûn. Bi tenê îmze avêtin mabû. Û 24ê Tîrmehê wek roja îmzekirina vê peymanê hatibû destnîşan kirin.

Piştî 3 mehan di 24ê Tîrmehê de li Sîwîsre li bajarê Lozanê, ev peymana ku nave xwe ji vî bajarê digire û di rûpelên dîroka siyasî de wek "Peymana Lozanê" tê binav kirin, hat îmze kirin.

Text bi frensî hatibû nivîsandin.Yek nushe bi tenê hat îmzekirin û ev jî ji aliyê Frensa ve hat hilanîn. Her dewletî nusheyek dane wan.

Peymana Lozanê ji 3 beşên esasî pêkdihat.

Beşa yekem, beşa esasî û ji 143 xalan pêk dihat. Beşa duyem, îlaveyê beşa esasî bûn. Beşa sêyem, ji nameyên ku di navbera dewleta Tirk û dewletên dinan pêk dihat.

## VEGERA HEYETÊ

Heyeta Tirkiyê bi serfîraziyek mezin vegeriya Enqerê.

Ji aliyê dewletê ve bi pêşwaziyek mezin hatin pêşwazî kirin.

Tirkiye sînorê xwe yên îro bi destxistibû. Lê di siyaseta xwe de guhertinek çênekir. Sozên ku dabûn kurdan di demek kurt de jibîr kirin.

Li Meclisê di navbera kurdan û parlementerên din de nîqaşan destpêkir.

Îsmet Înonuyê ku li Lozanê weha gotibû;

''Li Lozan'ê Kurdan serî li me nedan. Heta me di axaftinên xwe yên Lozanê de doza xwe ya netewî wek 'em Kurd û Tirk' yanê wek yek milet me parast û da qebûlkirin.''

Di civîna girtî a meclîsê de gava Îsmet paşa biryara peymana Lozanê a ku Mûsil ji Ingilîzan re dihişt xwend, mebûsên kurd li dij biryarê derketin û gotin, divê kurd ji îro pê de qedera xwe bi destê xwe tayin bikin.

Piştî ku Musûl dane Îngilîzan Şêx Mehmûd Berzancî li dijî vê yekê derket û li hember Îngilizan serîhilda. Di heman demê de balafêrên Îngilîzan dest bi bombekirina başûrê Kurdistan kirin.

Dema ku Peymana Lozanê dihat morkirin, li bakûrê Kurdistanê jî serekên Kurd lihev diçûn û dihatin. Di rojên Peymana bajarê Lozanê de, li bajarê Erziromê jî serek û rewşenbîrên Kurdan dinav xwe û Azadî de peymanek lidardixistin.

Bi vî awayî di sala 1923an de Rexistina Azadî hatibû damezrandin û amadekariyên serhildanekî mezin dihat lidarxistin. Dîplomatên kibar yên bismokîn bûbûn sedem ku li Kurdistanê pêvajoya serhildan û qetlîaman destpêbike.

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 420 25 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Serçeteyê Feyleq El-Şamê hate kuştin



Şervanên YPG'ê li Efrînê li dijî leşker û çeteyên dagirker çalakiyên bi bandor lidardixin. Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê bi daxuyaniyekê ragihand ku hêzên wan li dijî serçeteyê "Koma Keşfê" yê bi navê Mihemed Elî yê girêdayî çeteyên Feyleq El-Şamê çalakiyek li dar xist û di encamê de serçete hate kuştin.*R-2*

# LOZAN: XENCERA KU KURDISTAN BIRÎNDAR KIR

***Kurdistan ku weke cografîk cara yekem di sala 1639'an di navbera împaratoriyên Osmanî û Safewî de hat du perçekerin, di 24'ê Tîrmehê sala 1923'an de bi Peymana Lozanê di navbera Tirkiye, Sûriye, Îran û Iraqê de hat çar parçekirin.***




## BI LOZANÊ QIRKIRINA KURDAN DEST PÊ KIR

Yek ji êş û trajediyên ku Kurd dikişînin û heta niha berdewam dike parçekirin û birîndarkirina cografya Kurdistanê ya ku bi Peymana Lozanê pêk hat. Bi mor kirina Peymana Lozanê re li dijî Kurdan siyaseta qirkirinê ket meriyetê û pêrsgirêka kurd her çû kûr bû rê li ber gelek êş û eleman vekir. Hêzên komploger û navnetewî bi vê peymanê xwestin gelek armancên xwe di berdêla qurban kirina kurdan de pêk bînin.

## PEYMANA TRAJÎK YA LI DIJÎ KURDAN

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ser armancên Peymana Lozanê wiha dibêje, "Bi îmzekirina Peymana Lozanê û îlana Komara Tirkiyê re qonaxeke nû dest pê dike. Aloziya Mûsil û Kerkûkê ya bi Ingilîzan re dewam dikir, hewl dan bi peymaneke gelekî trajîk a li dijî Kurdan bigihînin encamê. Îngilizan ji bo dewleta netewe ya Tirk a nû jêre nebe tehlûke dixwest wê di nava sînorên teng de bigire. Peymana Lozanê encama vê nêzîkatiyê ye.

## KURD WÊ PÊŞENGTIYA DEMOKRATÎKBÛNÊ BIKIN

Rêberê Gelê Kurd Ocalan di 3'ê Tîrmeha 2009'an de di hevdîtina ku bi parêzerên xwe re kir de wiha digot, "Ji bo çareseriya ku pêş bikeve ez dibêjim Lozana Civakî. Lozan di sala 1923'an de Lozana Netewî ye. Bi vê Lozanê komara Tirkiyê ava bû. Niha pêdiviya vê komarê bi demokratîkbûnê heye. Ji bo vê dibêjim Lozana Civakî. Bi vê Lozana Civakî Kurd wê pêşengiyê ji demokratîkbûnê re bikin." *R-4*

## Tevgera Azadî ji bo çareseriyê 5 xal pêşkêş kir



Ev demeke li Iraqê çalakî û xwepêşandan tên lidarxistin. Desteya Rêveber a Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê têkildarî xwepêşandanên li Iraqê daxuyaniyek nivîskî belav kir. Tevgera Azadî ji bo çareseriya rewşa Iraqê 5 xal destnîşan kir û diyar kir ku yekane rêya çareseriyê jî pêkanîna daxwazên welatiyane. *R-5*

## Hizba Komunîst bertek nîşanî dagirkeriya Tirk da

Li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ya li ser axa Iraq û başûrê Kurdistanê nerazîbûn her roj zêde dibin. Berpirsê komîteya Mehelî ya Kerkûk yê Hizba Komunîst a Iraqê Reysan Hisên dagirkeriya dewleta Tirkiyê şermezar kir û diyarkir ku divê Hikûmeta Iraqê li hember vê dagirkeriyê bibe xwedî helwest. *R-4*

## Ji her qadê jin tevlî kongreyê bûn




Rêxistinan Jinan a Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) yekemîn kongreya xwe li Navenda Aram Tîgran a li bajarokê Rimêlan li dar xist. Di dawiya kongreyê de encamname hat eşkerek kirin. Her w ha di kongreyê de meclîseke ji 28 jinên ji hemû pêkhateyan hat ava kirin. *R-3*

## Ji ber erdhejê nêzî 300 kes birîndar bûn

Li eyaleta Kirmanşanê ya Rojhilatê Kurdistanê, roja Yekşemê bi şîdeta 5.9 pileyî erd hejiya û nêzî 300 kes birîndar bûn. Waliyê Kirmanşanê Hûseng Bazvand got, "ji ber erdhejê herî kêm 287 kes birîndar bûne." Bazvand diyar kir ku tedawiya piraniya birîndaran qediya ye û ji nexweşxaneyan derketine. *R-2*

## Rê hat kontrol kirin, 9 leşker hatin kuştin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê diya rkir gêrîlayên wan rêya navneteweyî ya navbera navçeya Ebex a Wanê û navçeya Bazîd a Agiriyê kontrol kirine û 6 Tireks jî hatine şewitandin. HPG'ê diyar kir ku li Colemêrgê jî 9 leşker hatine kuştin. *R-2*

## Divê hemû gel li Ocalan xwedî derkevin



Siyasetmedarê Kurd Dr. Faîq Gulpî nerazîbûn nîşanî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan da û wiha got, "hêzên desthilatdar ên naxwazin fikrên Ocalan belav bibin di tecrîdê de israr dikin, lê êdî fikrên Ocalan belav bûne û tecrîd ne çareserî ye. Hewce ye gelên Rojhilata Navîn jî li Ocalan û fikrên wî xwedî derkevin." *R-4*

## Tecrîd şer û aloziya li Tirkiyê girantir dike




Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan işaret bi tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kir û anî ziman ku tecrîd sûcekî li dijî mirovahiyê ye. Bûldan wiha got, "3 salin agahî ji Birêz Ocalan nayê girtin. Ger tecrîd bê rakirin wê gelek pirsgirêkên li Tirkiyê çareser bibin." *R-3*

# Serçeteyê Feyleq El-Şamê hate kuştin

***Şervanên YPG'ê li Efrînê li dijî leşker û çeteyên dagirker çalakiyên bi bandor lidardixin. Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê bi daxuyaniyekê ragihand ku hêzên wan li dijî serçeteyê Koma Keşfê yê bi navê Mihemed Elî yê girêdayî çeteyên Feyleq El-Şamê çalakiyek li dar xist û di encamê de serçete hate kuştin.***



Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê bi daxuyaniyekê ragihand ku hêzên wan li dijî serçeteyê "Koma Keşfê" ya girêdayî çeteyên Feyleq El-Şamê çalakiyek li dar xist û di encamê de serçete hate kuştin.
Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê derbarê çalakiya hêzên wan li herêma Raco ya Efrînê de daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Daxuyanî wiha ye:
"Şervanên me şeva 22`yê Tîrmeha 2018`an de çalakiyek li dijî serçeteyê "Koma Keşfê" ya girêdayî çeteyên Feyleq El-Şamê bi navê Mihemed Elî ku bi navê 'Ebû Ducane' tê naskirin û bi eslê xwe ji parêzgeha Laziqiyê ya Sûriyê ye, li dar xist.
Şervanên me dema serçete Mihemed Elî bi erebeya xwe ya li ser rêya Meydan Ekbes û Qera Baba yên girêdayî herêma Raco ya Efrînê diçû, çalakî pêk anî. Di encama çalakiyê de, serçete Mihemed Elî hate kuştin."

## Rê hat kontrol kirin, 9 leşker hatin kuştin



Gerîlayên HPG'ê rêya navneteweyî ya navbera navçeyên Ebex û Bazîd kontrol kirin.
HPG'ê ragihand ku di çalakiyê de 6 TIREKS ji aliyê hêzên wan ve hatine şewitandin û li Colemêrgê jî 9 leşker hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên li Colemêrg û Agiriyê daxuyanî da. HPG'ê diyar kir ku rêya navneteweyî ya navbera navçeya Ebex a Wanê û navçeya Bazîd a Agiriyê kontrol kirine û rê li trafîkê girtine.
HPG'ê ragihand ku di çalakiyê de 6 TIR ji aliyê hêzên wan ve hatine şewitandin û li Colemêrgê jî 9 leşker hatine kuştin.
HPG'ê li ser çalakiyan ev agahî da:
"Li Eyaleta Serhedê hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî de roja 21'ê Tîrmehê seat 09'an rêya navneteweyî ya navbera navçeya Ebex a Wanê û navçeya Bazid a Agiriyê kontrol kirin. Di vê çalakiyê de gelek wesayît hatin rawestandin û li ser pêvajoyê hêzên me gel agahdar kirin. Di heman demê de 6 TIR'ên kesên ku bi dijmin re kar dikin ji aliyê hêzên ve hatin şewitandin û 4 TIR bi temamî hatin rûxandin. Demek dirêj artêşa TC a dagirker nekarî mudaxleyî cihê bûyerê bike û rêya navneteweyî li trafîkê hate girtin.

### 9 LEŞKER HATIN KUŞTIN

Wesayîtên zirxî yên ji bo mudaxeleyê hatin cihê bûyerê bûn hedefa hêzên me. Di çalakiyê de derb li wesayîteke zirxî ya bi tîpa kirpî hate xistin û 2 leşker hatin kuştin.
Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Agirî û Şehîd Pîroz de hêzên me roja 21'ê Tîrmehê saet 20'an li dijî yekîneyeke artêşa TC a dagirker ku li ser girê Deriyê Xîz ê herêma Deriyê Cafer a navçeya Gever a Colemêrgê bû çalakiyek li dar xistin. Bi awayekî serketî li çeperên dijmin hate xistin û di çalakiyê de 2 çeper û konekî dijmin hatin rûxandin. Di vê çalakiyê de bi qasî hate tespîtkirin 7 leşkerên dijmin hatin kuştin."

## Li Hewlêrê 3 êrîşkar hatin kuştin




Li bajarê Hewlêrê yê başûrê Kurdistanê, li dijî avahiya walîtiyê êrîş hate kirin. Hate ragihandin ku 3 kesên êrîş birin ser avahiyê hatine kuştin.
Li Hewlêrê roja 23'ê mehê danê sibehê saet 07:45'an, sê kesên nenas ên bi çek ketin hundirê avahiya walîtiyê. Li gorî rayedarên walîtiyê, êrîşkaran li ber deriyê avahiyê polîsek birîndar kirine.
Alîkarê walî Tahir Abdullah diyar kir ku kesên çekdar saet 07:45'an hatine ber avahiya walîtiyê û gule li endamên ewlekariyê reşandine. Abdullah got, "Ketin hundirê avahiyê û piştre derketin qatê sêyemîn.
Tedbîrên berfireh ên ewlekariyê li dora avahiyê hatin girtin û bi saetan dengê çekan ji avahiyê hat. Çavkaniyên herêmî gotin, kesekî dîlgirtî hatiye rizgarkirin. Destpêkê hate ragihandin ku du êrîşkar hatine kuştin. Saet derdora 12'an jî hate ragihandin ku êrîşkarê sêyemîn jî hatiye kuştin.
Waliyê Hewlêrê Newzad Hadî civîneke çapemeniyê li dar xist û got, "Di êrîşê de karmendekî jiyana xwe ji dest da."
Şer nêzî çar saetan dewam kir. Li gorî Ajansa Nûçeyan a Fransayê (AFP), duyemîn payebilindê Midûriyeta Emniyetê Ferhad Mûhammed got, "Operasyon piştî ku sê êrîşkar hatin bêtesîrkirin, qediya."
Mûhammed diyar kir ku gelek personelên ewlekariyê birîndar bûne, lê agahiyên berfireh neda.
Yekîneya Antî Teror a Hewlêrê ya girêdayî Konseya Ewlehiyê di malpera xwe ya fermî de daxuyaniyek da û ragihand ku hersê êrîşkar welatiyên Hewlêrê ne.
Di daxuyaniyê de wiha hate gotin; "Hersê êrîşkar jî welatiyên Hewlêrê ne. Hate tespîtkirin ku hersê êrîşkar jî li hewlêrê xwendevanên amadeyî ne."
Navên êrîşkaran wiha ne; "Rêhel Mihemed Rostem Mûsa sala 2002'an li Hewlêrê jidayikûye, Bîlal Silêman Ebdûlrrehman Ehmed sala 2000'an ji dayikbûye û Ebdûlrehman Rehîm Qadir Hûsên sala 2002'an li Hewlêrê jidayikbûye."

## Di êrîşekê de bi dehan çete hatin kuştin



Hate ragihandin ku êrîşeke bi erebeyeke bomebebarkirî li dijî baregeheke çeteyên "Mertala Firatê" li bajaroka Raî pêk hat, li gorî agahiyan bi dehan çete hatine kuştin û birîndar bûne.
Li gorî agahiyên ku çavkaniyên ji herêmên bi bin serweriya çeteyên "Mertala Firatê" de dane, li gundê Bab Leymûn ê bajarok Raî ya bakurê Helebê êrîşeke bi erebeyeke bomebekirî civîna fermandarên komên leşkerî yên girêdayî Tirkiyê kir hedef.
Li gorî agahiyên destpêkê bi dehan kuştî û birîndar çêbûn. Tê gotin ku di êrîşê de hejmarek sivîlan jiyana xwe ji dest dane.
Li aliyekî din jî, hate ragihandin ku piştî êrîşê yekser êrîşeke din jî bi motosîkleteke bombebarkirî pêk hat. Lê ve yek nehat piştrast kirin.
Tê zanîn ku gundê Bab Leymûn wekî baregeha sereke ya çeteyên DAIŞ`ê dihat dîtin û niha jî navendeke girîng ya çeteyên Tirkiyê ye. Li vî gundî beriya çend salan gelek civînên veşartî di navbera serbazên artêşa Tirk a dagirker û serçeteyên DAIŞ`ê de hatin kirin…
*ANHA*

## Ji ber erdhejê nêzî 300 kes birîndar bûn



Li eyaleta Kirmanşanê ya Rojhilatê Kurdistanê, roja Yekşemê bi şîdeta 5.9 pileyî erd hejiya û nêzî 300 kes birîndar bûn.
Waliyê Kirmanşanê Hûseng Bazvand got, "ji ber erdhejê herî kêm 287 kes birîndar bûne." Bazvand diyar kir ku tedawiya piraniya birîndaran qediya ye û ji nexweşxaneyan derketine.
Erdheja ku li Taze Abadê rû da, li bajarê Garb ê Îslamabadê û Sarpolê Zahab û li hin gundên eyaletê bû sedema xisarê. Li gorî rayedaran li 43 gund û 101 wargehan xisareke giran rû daye.
Mijdara 2017'an li eyaleta Kirmanşanê bi şîdeta 7.3 pileyî erd hejiya bû û 620 kesan jiyana xwe ji dest dabûn, 12 hezar kes birîndar bûbûn. Li Başûrê Kurdistanê jî 8 kes miribûn.

## Rûsya û Îsraîl'ê li ser Sûriyê hevdîtin kirin



Wezîrê karên derve yê Rûsyayê Lavrov û serokerkanê Rûsyayê, li ser mijara Sûriyê bi serokwezîrê Îsraîlê Benyamîn Netanyahu re rûniştin.
Ajansa AFP`ê ragihand ku hevdîtina li Qudsê ya bi perspektîfên serokê Rûsyayê Vladimir Pûtîn pêk hat û da zanîn ku her du aliyan di civînê de rewşa Sûriyê guftûgo kirin.
Ev serdan çend roj piştî hevdîtina Pûtîn û Netanyahu ya ku li Rûsyayê pêk hatibû, de pêk hat.




# Ji bo zarokan dewreyên havînê tên vekirin

***Navenda Aram Tîgran a Çand û Hunerê li bajarokê Rimêlan ji bo zarok fêr bibin dewreyên havînê yên muzîk, stran û şanoyê vedike. Berpirsyarên navendê diyar kirin ku armanca wan ji van dewreyan ew e ku zarok û ciwan bi awayekî baş ji betlaneya havînê sûdê wergirin û di aliyê hunerî de xwe bi pêş bixin.***



Navenda Aram Tîgran a Çand û Hunerê li bajarokê Rimêlan ji bo fêrkirina muzîk, stran û şanoyê dewreyên havînê vedike. Heta niha 90 zarok tev li çalakiyên navendê bûne. Navend ji beşdarbûna Çaremîn Mîhrîcana Zarokan a Çandî re xwe amade dike.
Navenda Aram Tîgran a Çand û Hunerê li bajarokê Rimêlan, çalakiyên xwe yên çandî didomîne. Hejmarek komên stran, şano û govendên gelêrî girêdayî navendê ne. Her wiha navend ji bo pêşxistin û xurtkirina şarezayên zarokan dewreyên havînê vedike.
Bi rasthatina havînê û bidawîbûna sala perwerdeyê re, navenda Aram Tîgran a Çand û Hunerê ji bo fêrkirina lêdan, stran, şano û govendên gelêrî dewreyên havînê bê pere ji zarokan re vekirin.
Berpirsên navendê tekez kirin ku armanca wan ji van dewreyan ew e ku zarok û ciwan bi awayekî baş ji betlaneya havînê sûdê wergirin û şarezayiyên xwe yên hunerî bi pêş bixin. Her wiha destnîşan kirin ku dewreyên havînê tevî fêrkirin û xurtkirina şarezayiyên zarokan, navend bûye cihê ahengiya zarokan.
Vê salê 90 zarok tev li dewreyên havînê bûne, temenên wan di navbera 4-13 saliyê de ye. Li ser refên fêrbûna lêdan, stran û solfêj, govendên gelêrî û şano hatine belavkirin. Her wiha mamosteyên di hunerê de pispor, perwerde didin.
Ji zarokên ku tev li dewreya havînê bûne, zaroka bi navê Îsraa ya ji pêkhateya Ereb, dibêje ku ji ber hezkirina wê ji muzîk û çanda kurdî beriya 2 salan ve tev li dewreya havînê beşa stran û govendên gelêrî bûye. Her wiha ji bo xwe bi pêş bixe, Îsraa tev li dewreyên di sala xwendinê de dibe.
Li gel dewreyên havînê, komên girêdayî Navenda Aram Tîgran a Çand û Hunerê ji bo beşdarbûna Çaremîn Mîhrîcana Zarokan a Çandî bi sponsoriya Tevgera Çand û Hunerê û Desteya Çand û Hunerê yên kantona Cizîrê ku salane li dar dikeve, xwe amade dikin.
Her wiha di dawiya her dewreyekê de ezmûnek ji perwerdekaran re tê çêkirin. Kesên ku bi ser ketine yan bi komên taybet yan jî bi komên girêdayî navendê dikarin beşdarî mîhrîcanê bibin…*ANHA*

## Pênûsa jin bi tekoşînê bi hêz dibe





**Melek DEMÎRTAŞ**

Ji destpêka Şoreşê rewşa xwendin û nivîsandin lawaz ma, heya li hen herêmên wêrankirinî nema bû. Di van rewşan de rol û nameya nivîskaran çiye? taybet rol jinên rewşenbîr di ronî kirina hişmendiuya jin û civakê çiye? Ji ber ku di riya tureyên medeyayê, her wiha ev şerê 7 salan xwendin û nivîsandin kêm ma, di rewşek wiha de mîna vê pêşengê girîne, da ku têkîliyan xwendevan û pirtûk vegerîne.
Girêdayî mijarê jinên rewşenbîr diyar kirin ku ji bo pênûsek azad pêwîstî bi tekoşîn û mina van pêşengehan heye."

### JİN TEVLÎ BÛN LÊ NEBESE

Nivîskae û Helbestvan Hena Dawid derbarê rol û beşdarbûna jin di pêşengehê de wiha got: " Tevî kêm pênûs û hişmendiya desthilatdarî de derbasbûye lê, dîsa tevlî bûna jinê heya astekî başe. Di 1.Pêşengeh û ya duyemîn di milê reng, orgenîze û tevlîbûn taybet ya jinê muqayese bikin, emê balkêş bibînin. lê ev têrênakê pêwîste hîn bêhtir hebe."

### ERKA REWŞENBÎRTİYÊ RONÎKIRIAN CIVAKÊ YE

Hena bal kişand ser sedemên kêm pênûsê jin û wiha got: "Jinên xwedî pênûs kêmin, ne ku hene û tevlî nabin û ev kêmbûn jî xwe dispêre hişmendiya desthildariya mêr û civakê, heger pênûsa jin hebiya jî di warê xwe îfadekirin û biryardarî de lewaz dima. Jiber hîn ew hişmendiya 5 hezar sal ser jin û pênûsa wê bendore, Ji destpêka dîrokê haye berî şoreşê jin di warê rewşenbîrtiyê de lawaz bû, Ji bo wêjî jinên ku beşdarbûna piranî di wêjeyîde sînordar man. Her wiha kes hebûn xwedî pênûsin xurtbûn lê mixabin dev ji erkên rewşenbîrtiya qeriyan û çûn, ez dibêjim van kesan ku derheqên jin û rewşenbîrtiyê de xayîntîkirin, ji bo wê jî pêwîste jin bixwe ser xwe bixebite."

### PÊNÛS DENGÊ HEQÎQETÊ YE

Hena Dawid bi van axaftina bi dawî kir: "Ez wekî jinek bi salan dinivîsînim, rastî gelek astengiyan hatim, taybet berî şoreşê, lê min beramberî van astengiyan bêhêz nemam û bi pênûsa xwe şer kir. pênûs bêdeng nehişt, ji ber ew pênûsa heqîqete nabe bê den û reng bimîne."

### JİN Bİ NİVÎS Û TABLOYAN

### BEŞDARBÛN

Berpirsa Bîroya ragihandina Desteya çandê ya Herêma Cizîrê, her wiha wênesaz Leylan Cemal da zanîn ku bi du tabloyên wênesaziyê (Şêwekar) tevlî 2.pêşengehê bû. Û wiha got:"Jin çi helbest, wênesaziyê û nivîskarên mîna Ronak Murad, Anahîte Sîno, Loran Xetîb, Henan û Heva Heyder cihê xwe di pêşngehê de girtin."

### Bİ WÊNESAZİYÊ BERWXEDANA JİN VEGOT

Leylan armanca xêzkirina tabloyan wiha bi lêvkir: "Tabloya yekemîn di hevdîtina Rojava ya Şêwekariyê li Kobanê xêzkiribû, yadin jî li Qamişlo xêzkir. Her tabloyek hestek û çîrokekê vedubêje, tabloya ku jin li rojê dinere tê wateya ku jina berxwedêr li dijî hişmendiya kor û kevneşopiyên civakê şerdike, bi vîn û hêz ew jin li rojê dinere, yanî çwa roj bi rohniya xwe civkê ronî dike ew jî bi tekoşîna xwe civakê azad bike. Tabloya duyemîn î rengê xwezayî derxist pêş, wekî daristan û mij heye, rengê xemgînî heye, lê ev rewşa jin di 5 hezar salî de ifade dike, di şoreşa 40 salî de jin bi tekoşîna ev taritî û mijîa ser çavê dîrokê hiland, di riya tabolyande ev name bighînim."

### 17 HEZAR PİRTÛK


Leylan Cemal di dawîd bi bîrxist ku 14 hezar pirtûk tevlî vê pêşngehê bûn û hîn 3 hezar pitûk di rêdene wiha 17 hezar pirtûk bi mijarên cûda di sîwanekê de komkirin bi serê xwe serkeftine."

## Mîhrîcan bi dayîn spasnameyan bi dawî bû



Saziyên ku li ser serxistina Mîhrîcana Girê Spî ya Çand û Kevneşopiyan sekinîn û endamên ragihandina azad ku çalakî şopandin, hatin xelatkirin.
Duyemîn Mîrhîcana Girê Spî ya Çand û Kevneşopiyan ku li bajaroka Eyn Erûs hat lidarxistin, di roja duyemîn bi pêşkêşkirina spasnameyan de bi dawî bû.
Di çalakiyên roja duyemîn de, xwarinên gelerî yên herêmê hatin pêşkêşkirin.
Paşê, koma şano ya Dewha ya taybet bi çanda koçeran şanoyek pêşkêş kir. Pêkhateya Kurd jî bi tevlêbûna bi dehan jinan dawetek ku îşaret bi çanda daweta li gel kurdan dike, pêşkêş kirin.
Di çalakiyê de, bêşbirkeke fubolê di navbera Tîma Wehda û Tîma Eyn Erûs de hate lîstin. Di lîstikê de Tîma Wehda bi ser ket.
Di dawiya mîhrîcanê de, Komîteya Amadekar , spasname û xelat dan saziyên ku mîhrîcan bi rêxistin kirin, her wiha endamên Yekîtiya Ragihandina Azad ku çalakî şopandin, jî hatin xelat kirin…*ANHA*

## Wêneyên Hêzên Asayîşê bal kişandin



Di pêşangeha pirtûkan a Qamişloyê de 25 wêneyên Hêzên Asayîşê hatin pêşkêşkirin. Endamê ragihandina Hêzên Asayîşê Xwînrêj Temê diyar kir ku armanca wan ew e ku bi rêya wêneyan jiyan û karên endamên Hêzên Asayîşê nîşanî gel bidin.
Di pêşangeha pirtûkan a bi navê Şehîd Herekol de 25 wenêyên Hêzên Asayîşê hatin pêşkêşkirin. Naveroka wêneyên Asayîşê li ser perwerde, xizmet û jiyana endamên Asayîşê ye. Her wiha wêneyên endamên Hêzên Asayîşa TAybet (HAT) û Hawarî jî cih girt.
Endamê ragihandina Hêzên Asayîşê Xwînrêj Temê li ser wêneyên Hêzên Asayîşê axivî û diyar kir ku armanca wan ew e bi rêya wêneyan jiyana endamên xwe nîşanî gel bikin û wiha got: "Hêzên Asayîşê di nava gel de xebatên ewlehiyê dikin. Armanca me bi rêya wêneyan jiyan û karên endamên Hêzên Asayîşê nîşanî gel bikin."
Di sala derbasbûyî de jî 30 wêneyên hêzên Asayîşê hatibûn pêşkêşkirin.

# Navenda tenduristiyê bû nexweşxane

**Li taxa Şêxmeqsûd ya Helebê xebatên xizmetî berdewam dikin. Navendeke tenduristiyê ku ji bo dermankirina birîndarên şer li taxa Şêxmeqsûd a Helebê hate vekirin, niha bû Nexweşxaneya Şehîd Xalid Fecer û ji bo dermankirinê xizmeta welatiyan dike. Di nexweşxaneyê de bi giştî 34 doktor û bi dehan xebatkar dixebitin.**






Navenda tenduristiyê ya ji bo dermankirina birîndarên şer hate vekirin, bû nexweşxanyeke ku bi hezaran nexweşên Helebê derman dike.

Navendeke tenduristiyê ku ji bo dermankirina birîndarên şer li taxa Şêxmeqsûd a Helebê hate vekirin, niha bû Nexweşxaneya Şehîd Xalid Fecer ku bi hezaran nexweşên bajarê Helebê derman dike.

Di vê çarçoveyê de, ji ber pêwîstiyan rêveberiya nexweşxaneyê beşên nexweşxaneyê berfireh kirin, her wiha kadroyên wê jî zêde kirin. Di nexweşxaneyê de beşên ku hatin vekirin wiha ne: Çerm, guh, zarok, hestî, çav, nexweşiyên hundirîn, dil, jin, damar, radyolojî.

Di nexweşxaneyê de 4 jê dilxwaz 34 bijîşkên pispor, her wiha 82 berdestên bijîşkan û xebatkar dixebitin.

Li gorî rêveberên nexweşxaneyê, rojane 100 nexweş ji bilî nexweşên diranan û nexweşên jin, serdana nexweşxaneyê dikin. Rojane 50 xexweşên diran û nexweşên jin jî têne nexweşxaneyê.

Ji rêveberên Nexweşxaneya Şehîd Xalid Fecer, Welat Memo destnîşan kir ku tenê Heyva Sor a Kurd û hinek welatparêzên ji derve destekê didin wan.

Memo da zanîn ku ew amade ne cureyên hemû emeliyatan ji bilî hinek emeliyatan ew jî ji ber nebûna alavên tenduristî, bikin. Memo bi bîr xist ku li ber rewşên hinek nexweşan, wan 25 ode ji bo wan amade kirin û nexweş bi rojane dikarin li wir bimînin.

Ji aliyê din ve, nexweşxane rewşa aborî ya herêmê jî di ber çavan re derbas dike û li gorî derfetên xwe ji welatiyan re dibe alîkar.

Welat Memo di dawiya axaftina xwe de, anî ziman ku ew amade ne şev û roj xizmeta şêniyan bikin… *ANHA*

# Şoreşa Rojava û Wêje



Medeni FERHO

Her şoreş bi idea bextewariya mirovan dest pê dike. Wêjeya cîhanê jî ev îdea pejirandiye û diparêze. Du tiştên bingehîn bandorê li pêşketinên şoreşan dikin, azadî û aqil!.. Hemû îdeolojî bi gotina "azadî û aqil" dixwazin cîhanşûmûlî bibin. Lêberalîzm jî, soyalîzm jî bi heman îdealê haraket dikin. Di pratîka her du sîsteman de aqil heye, azadî nîne!.. Lê her du sîstem jî wêjeya cîhanê himbêz dikin, xelatgîr dikin û dixwazin bikarbînin. Wêjeya cîhanê, ji sedî 99, bi "meyl-î soyalîst" haraket dike. Lê lîberalîzm sûdê digire û wek Selahaddîn Eyyubî, hem avê, hem agir di destên xwe de digire.

Bêguman mijara me ne destnîşankirina tivêla rûdêna lîberalîzm û sosyalîzmê ye. Mijara me Şoreşa Rojava ye. Şoreşa Rojava, bi taybetî li Rojhilata Navîn dengekî nû ye!...

Şoreşa Rojava bûye hêvî, di xeta sêyemîn de, (îdea gelê demokratîk), riya "azadî û aqil" zemt kiriye. Gelên li herêmê jî, ev xet pejirandine û ligel Kurdan cih girtine. Di nava gelên herêmê de, ereb jî hene û eşîr in. Ev eşîr bi toreya xwe ve girêdayî ne. Bêguman mafê wan e, lê eger tore bi pêşketin û hişmendiya demê re xwe nû nekin, xwe neguherin, dikarin li hemberî pêşketinan bibin asteng. Ev mînak, ji bo hemû beşên civakan e!..

Di şoreşan de rola wêjeyê giring e. Yanî stewihandina hişmendiyê!.. Wêja, şûrê mêjî av dide, dikê pola û disû... Muxatabê wêjeyê, tevahiya mirovahiyê ye; ne eşîr, ne pêşengên şoreşê, ne jî komên xelkê dikarin ji giringî, delalî û germahiya wêjeyê birevin. Wêje, rengekî perwerdê ye, di şoreşan de perwerde giring e.

Şoreşa Rojava, hem bi şans e, hem bêşans e!.. Şans, paradigmeya Ocalan e. Ocalan piştî Hegel, Marx, Bebel û Braudel, beşên civakî, mafê jinan di çarçoveya felsefî, dîrokî û sosyolojîk de, ji nû de nirxandine. Ocalan kultur e, pirtûk e û têgihiştin e!.. Ocalan pêşî kultur, têgihiştin, xwenaskirin, perwerde û xwe rêxisitinîkirin e. Lewma, Ocalan bû dergehekî nû û wek altrenatîfa cîhana du serî derkete holê.

Sahîh e ku, pêdiviya Şoreşa Rojava û parastina wê di gelek aliyan de heye. Ji bo vê jî, min mînaka agir û ava di destê Selahaddîn Eyyubî de da.

Dema ku Selahaddîn Eyyubî, bajarê Basra zemt kir, di destê raste de sewilek av, di destê çepê de meşaleyek girt û kete bajêr. (790), Helbestvana Ereb, Rabia El Adeviyye, hingî helbesta "Agir û Av" nivîsî. Dibêje: "Ez ê meşaleyê biavêjin behiştê / Avê biavêjim agirê dojehê / Divê Xwedê bi evîna wî werê fêm kirin / Ne bi agirê dojehê / Yan jî bi hêviya behiştê"

Şoreşa Rojava, dengek, heyecanek û deriyekî nû ye; demjiyana trajedî û destanên sedsalê derxistin holê. Ji demjiyana helenîstîk, şoreşa Fransa û reel soyalîzmê cûda, demjiyana Kurd-îtopya derxiste holê!.. Pêdiviya Kurd-îtopya bi teqîna kulturê heye. Wêjeya Kurdî, li pey derfetan digere û divê Şoreşa Rojava di vê mijarê de hamleyekê bike.

Rojhilata Navîn, di krîzeke mezin de ye, komên çete û dewletên çete kabûs in; Û em dibêjin, rizgarî di paradîgmeya Ocalan de; divê em zanibin ku paradîgmeya Ocalan kultur e, wêje ye, têgihişin û rêxistinî-tifaq e.

Başûr, mixabinî û heyloo ye!.. Li Bakur hêvî hebû, diktatoriya epîlepsîk (faşîzma serdemê) ew hêvî kuşt. Divê her Kurd zanibe ku li çar aliyên Kurdistanê gurên har hene; li derveyî cîranan jî, komplogerên kîndar, bazirganên selefkar hene. Ligel mînaka agir û ava Selahaddîn Eyyubî, serdema 4. ya Roma jî dikare bibê mînak. Heyecan, derfet, hêvî, deriyê nû û dengê nû!... Pirtûkan, her dem, bandor li destîniya mirovan kiriye.

# Pira kevn tê sererastkirin



Meclisa Sivîl a Reqayê ji bo ku çûn û hatinê hêsantir bike, pirên kevn ên li bakur û başûrê bajar ên li ser çemê Firatê bi hev du ve dide girêdan û dest bi xebatên sererastkirinê kir.

Meclisa Sivîl a Reqayê ji 5'ê Tîrmehê ve dest bi çêkirin û sererastkirina pirên kevn kir. Xebatên sererastkirinê didomin.

Xebatên sererastkirina pirê ji du beşan pêk tê, ya yekemîn çêkirina pireke ji çîmentoyê, ya duyemîn jî avakirina pireke hesinî ye. Xebatên avakirinê niha di qonaxa yekemîn de ne.

Yek ji berpirsên sererastkirina pira kevn Ebdulrehman El-Hesen wiha got: "Em rojane xebata sererastkirinê dikin û hemû alavên sererastkirinê di destê me de hene û karê me berdewam e. Em niha bingeha pirê çêdikin û bi derfetên kêm jî em pira hesinî çêdikin."

Pira kevn ji bo welatiyên bajarê Reqayê û gundewarên wê û taybet aliyê wê yê bakur û başûr (gundên Kesrat û Şamiyê) girîngiyeke xwe heye. Şênî ji bo debara xwe di ser vê pirê re diçin û tên. Sererastkirina pirê li gel şêniyên Reqayê bû cihê kêfxweşiyê…*ANHA*

# 20 sale li penaberiyê hesinkariyê dike



Li wargehe penaberan a Mexmûrê welatiyê binavê Arif Yildirim 20 sale hesinkariyê dike. Arif diyar kir ku divê hemû gelê wargehê bi xwe pêwîstiyên xwe pêkbînin û berê xwe nedin ji derve.

Welatiyên wargeha penaberan a şehîd Rûstem Cûdî di salên 90'î de ji ber zilm û zordariya dewleta Tirk, neçarman berê xwe dan Başûrê Kurdistanê. Penaberên Mexmûr tevî zilm û zordariya dewleta Tirk û alîgirên wê berxwedanek bê hempa meşandin û karîn xwe bi xwe rêve bibin. Di Wargehê de gel ji bo debara xwe ya rojane bi karên cûda ve mijûl dibin û pêwîstiyên xwe bicih tînin.

Welatiyê binavê Arif Yildirim ev 20 sale li penabertiyê hesinkariyê dike. Arîf amûrên weke derî, pencere, tankerên avê û pêwîstiyên din yên gel çêdike. Arîf di temenê xwe yê 26 salî de, dest bi karê hesinkariyê kiriye û debara xwe bi vî karî dike. Ji bilî Arif 2 welatiyên din jî dinava wargehê karê hesinkariyê dikin. Lê Arif tenê karê çêkirina tankerên av yan jî tankerên din dike. Arif diyar kir ku her dû hevalên wî yên din karê qeynaxê dikin û ew jî weke hevalên xwe yên din pêwîstiyên gel bi cih tîne.

Arîf balkişand ser eleqeya ciwanan ya li ser karê hesinkariyê û diyar kir ku hewldanên ciwanan yê ji bo fêrbûna karê hesinkariyê hene, lê ji ber defet di destê wan de nîne ew nikare ciwanan baş fêr bikin.

Arîf wek sedem jî diyar dike ku di demên dawî de kar kêm bûye.

Di demên dawî de ji ber qeyrana aborî ya li başûrê Kurdistan û Iraqê ciwan jî betal mane. Qeyran bandora xwe li karê hesinkariyê jî dike.

Li ser vê yekê jî Arîf anî ziman ku beriya çeteyên DAIŞ'ê kar hebû û gel ji bo xwe kar dikir, lê piştî ku çeteyên DAIŞ derketin qeyrana aborî rû da û vê yekê bandorek li ser gelê wargehê jî kir.

Arîf di dawiya axaftina xwe de bang li gelê wargehê kir û got; "Daxwaza min ji gelê wargehê ewe ku hemû karê xwe dinava xwe de bikin û rêve bibin. Bila gelê me hemû pêwîstiyên xwe dinava xwede pêkbînin, da ku di aliyê madî de pere neçe ji derve û dîsan li wargehê vegere. Ger pereyê me biçe ji derve wê aboriya me jî bikeve û em ê jî bikevin nava qeyranê. Ez di wê baweriyê de me ku wê gelê me bi xwe karên xwe rêve bibin û xwe ji qeyranê azad bikin."… *ROJNEWS*

# Vekirina kampa El-Mehmûdlî hate paşdexistin

Kampa Mehmûdlî ya ku 25 km li bakurê rojavayê bajarê Tebqayê ye, ji bo pêşwazîkirina hejmarek ji malbatên ku li kampa Tiwêhniyê dimînin, wê bihata vekirin. Lê li ser daxwaza Komîseriya Bilind a Karûbarên Koçberan hate paşdexistin.

Berpirsê kampa El-Mehmûdlî û Tiwêhniyê Hisên Şihazê sedema li ser sedema paşdexistina vekirina Kampa El-Mehmûdlî wiha got: "Komîseriya Bilind a Karûbarên Koçberan ji bo destnîşankirina miqdara alîkariya ku ji bo kampê wê were dayîn, ji me xwest nêrînên wan bigirin."

Têkildarî sedemên pêşwazîkirin an jî veguhastina koçberan ji kampa Tiwêhniyê ji bo Kampa El-Mehmûdlî Hisên Şihazê wiha got: "Kampa Tiwêhniyê ji ber lehiyan gelek zirar dîtiye û piraniya konan telef bûne, her wiha xetên kanalîzasyonê tune ne û ji bajarê Tebqayê dûr e."



# Ji her qadê jin tevlî kongreyê bûn

***Rêxistinan Jinan a Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) yekemîn kongreya xwe li Navenda Aram Tîgran a li bajarokê Rimêlan li dar xist. Di dawiya kongreyê de encamname hat eşkerek kirin. Her wiha di kongreyê de meclîseke ji 28 jinên ji hemû pêkhateyan hat ava kirin.***




Encamnameya Yekemîn Kongreya Jinan a PYD'ê hate aşkerakirin. Di kongreyê de meclisek ji 28 endamên ji hemû pêkhateyan hate damezirandin.

Rêxistinan Jinan a Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) yekemîn kongreya xwe li Navenda Aram Tîgran a li bajarokê Rimêlan li dar xist. Di dawiya kongreyê de encamname ji aliyê endama Meclîsa PYD'ê Welîda Hesen ve hate xwendin.

Encamnameya kongreyê wiha ye: "Rêxistina Jinan a PYD'ê yekemîn kongreya xwe di 22'ê Tîrmeha 2018'an de li navçeya Rimêlan a Herêma Cizîrê bi dirûşma 'Jinên azad mîsogeriya civaka exlaqî û siyasî ne' lidarxistin. 266 endamên ji hemû herêmên ku rêxistina partiya me lê heye, çi li derve û çi li hundir, beşdar bûn.

Di hemû peyamên ku hatin xwendin de bal kişandin ser rola partiya me ku ji destpêka aloziya Sûriyeyê ve, di heman demê de rola pêşeng a jinan di partiya me de hate bibîrxistin.

Piştî peyamên pîrozbahiyê bi dawî bûn, xebatên rêxistinî yên kongreyê dest pê kirin. Di bernameya rêxistinî ya kongreyê de kar û xebat, perspektîfên siyasî û demokratîk, her wiha rola jinan hate nirxandin.

Di kongreyê de her wiha çalakiyên rêxistina jinên PYD'ê ku ji kongreyê re hatine pêşkêşkirin, hatin xwendin û nîqaş li ser reşnivîsa meclisa jinan hatin kirin. Her wiha hin xalên wê di encama nîqaşan de hatin sererastkirin.

Di kongreyê de rêzebiryarên siyasî û rêxistinî derbarê jinan hatin girtin. Di kongreyê de 28 endam ji bo Meclisa Jinan a partiyê hatin hilbijartin, endaman soz da ku wê xeta têkoşînê û felsefeya neteweya demokratîk bişopînin û ji bo pêşxistina rêgeza rizgarkirina jinan û şopandina xeta şehîdan û pêkanîna armancên wan dê têkoşînê were domandin û xeta wan were şopandin."

# Divê jin rêxistinkirina xwe fireh bikin



Endama PYD'ê Şerîfa Hisên diyar kir ku armanca kongreya damezrîner ew e ku hemû jinên ji ber sîstemên sermayedar êşê dikişînin ji zîhniyeta desthilatdar a mêran rizgar bibin di hemû aliyên jiyanê de xwe bi rêxistin bikin.

Endama Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Şerîfe Hesen ku ew jî beşdarî Kongreya Dameziriner a Rêxistina Jinan a PYD`ê bû got, "Em wek jinên PYD`ê, xwe wek endam di nava partiyê de bi rêxistin kir. Lê li gorî pêngava di dema niha de ji me tê xwestin ku em rêxistina xwe li ser asta Rojava-Bakurê Sûriyê berfireh bikin û navendên xwe li Reqa, Tebqa, Dêrazor û Ewropayê jî vekin da ku rêxistina me ya jinan berfireh were avakirin."


Şerîfe Hisên di berdewama axaftina xwe wiha got: "Ji ber wê jî di vê demê de, me kongreya rêxistina jinan a PYD'ê li dar xist da ku dengê me bigihîje hemû jinên Rojava, Sûriyê û hemû Ewropayê. Armanca me ji lidarxistina kongreyê ew e ku em bi hemû jinan re têkildar bin da ku jin bigihîjin azadiya xwe bi rêxistin bikin.Şerîfa tekez kir ku êrîşên li ser Rojava tên hemû di destpêkê de li ser jinan bûn, ji ber wê jî PYD'ê girîngiyeke mezin da rola jinan di civakê de.Di dawiya axaftina xwe de Şerîfe Hisên got: "Jinan di hemû qadên jiyanê de cih girtiye. Bi avakirina rêxistineke taybet ji bo jinan di nava PYD`ê de, jin wê bikarin hê zêdetir xwe bi rêxistin bikin…*ANHA*

# Dayîka Edlê bi xwezayê ve girêdayî ye

Jinên kurd ku heta roja îro çanda kurdî diparêzin îro jî bi modelên nû bejna xwe dixemilînin. Edlê Hisên a ku parastvana çanda kevnar a kurd e dibêje ku çandeke me ya kevnar a komunal heye.


Dayîka Edlê Hisên (63) dayîka 7 zarokan e. Edlê ya ku hemû zarokên wê jê cihê dijîn, bi tena xwe li malê dijî. Edlê a evîndara çanda kurdî bi rûkenî û bedewbûna xwe jiyanê tevahî dixemilîne.

Edlê, derbarê girîngiya parastina Çanda Kurd û kincên gelerî ku parçeyek ji wê çandê ne de wiha dibêje: "Ez jî wekî jinekê kurd bi kurdbûna xwe serbilind im. Divê ku çanda kurdî ya ku bi salan e hatiye pêşxistin neyê windakirin. Her netewek bi cil û bergên xwe yên neteweyî û bi zimanê xwe tên nasîn. Kurd jî bi zimanê kurdî yê dayîkê û kincên xwe yên neteweyî tên nasîn. Jinên kurd bi deng, reng û bedewbûna xwe rengê xwe didin derdora xwe."Edlê got: "Dema ez bi kincên xwe yên neteweyî derdikevim, ez xwe serbilind hîs dikim. Rihê çanda xwe hîs dikim, di serdema berê de rihê komunaltiyê di gundewarên me de hebû. Kesên civakê bi hev re dibûn alîkar. Rihê jinên afrîner û pêşxistina



çanda kurdî hebû."Edlê, ya ku evîndara xwezayê ye jî got, "Ez pir bi xwezayê ve girêdayî me. Min darên tirî, hêjîr, hinar, zeytûn û hin cûreyên gulan di bexçêyê mala xwe de çandî ye. Her serê sibê ez av didim ji bo ku bijîn. Ji ber ku ew jî zindî ne û giyanê wan heye. Xweza rengekî xweş dide mala min. Her danê ber bi êvarê ve ez û cîranên xwe li bin siya daran rudinîn."…*Songul Şêxo /Tiltemir*

# Tecrîd şer û aloziya li Tirkiyê girantir dike




Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan diyar kir ku tecrîd rê li ber şer û krîzê vedike û xwest, bi lez û bez hevdîtin bi Ocalan re were kirin.

Hevserokên Giştî û parlamenterên HDP'yî 20-22'ê Tîrmehê li Wanê li hev rûniştin û ji bo dema bê nexşerêyek amade kirin.

Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan got, "tevî her tiştî jî HDP bi tenê nehatiye hiştin û ji bendê derbas bûye."

Bûldan wiha axivî, "Di vê demê de erk û berpirsyariyeke mezin dikeve ser milê gelên Tirkiyê. Di vê demê de ku hiqûq û mafên mirovan hatine betalkirin, gelên Tirkiyê neçar in ku hîn bi xurtî têbikoşin."

Bûldan diyar kir, yekane hêza ku li dijî faşîzmê têdikoşe HDP ye û bi bîr xist rewşa li Kurdistanê timî awarte ye. Bûldan hişyarî da û got, "wê hîn bi tundî êrîş li hêzên mûxalîf, çep-sosyalîst were kirin."

**TECRÎD SÛCÊ LI DIJÎ MIROVAHIYÊ YE**

Di dewama axaftina xwe de Bûldan işaret bi tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kir û anî ziman ku tecrîd sûcekî li dijî mirovahiyê ye.

Hevseroka Giştî ya HDP'ê Bûldan got, "Tecrîd caran li hin girtîgehan dihate pêkanîn. Lê bi taybetî di nava 3 salên dawî de, yanî ji 5'ê Nîsana 2015'an û vir ve tecrîdeke gelekî giran li ser Birêz Ocalan heye. Destûr nayê dayin ku malbat û parêzerên xwe bibîne û agahî jê nayê girtin. Ev yek nîşan dide ku em ketine serdemeke ku îradeya siyasî rol û misyona Birêz Ocalan a dema bihurî ji nedîtî ve tê û hewl dide tine bike. Pêvajoyeke aştiyê û danûstandinan a ji 3 salan rû da. Bêguman ev pêvajo ji bo siyaseta Tirkiyê gelekî girîng bû. Di vê pêvajoyê de ku Birêz Ocalan tevlî bû, aramî û bawerî derkete holê û mirov nemirin. Weke serdema herî erênî cihê xwe di nava siyaseta Tirkiyê de girt."

Bûldan da xuyakirin ku bi qedandina hevdîtinên bi Ocalan re şer ji nû ve dest pê kiriye û bi vê yekê re li Tirkiyê gelek krîz derketine. Bûldan bi bîr xist ku 3 sal in agahî ji Ocalan nayê girtin û wiha dewam kir: "3 sal in agahî ji Birez Ocalan nayê girtin û di vî warî de biryareke îradeya siyasî heye. Pêwîste tecrîd bê rakirin. Divê Birêz Ocalan karibe ji mafên xwe yên însanî û hiquqî sûdê werbigire."

Bûldan diyar kir ku meseleya tecerîdê ne tenê meseleya Kurdan e, pêwîste di rojeva gelên Tirkiyê de be û got, "Ji ber ku şer ne tenê Kurdan mexdûr dike. Vê rewşê bi tecrîdê dest pê kir û bi rakirina tecrîdê dikare bê qedandin. Eger tecrîda li ser Ocalan bê rakirin, bi dîtina min wê gelek krîzên li Tirkiyê ji holê rabin."

# Jin jinûve evînê li ser vê xakê şîn dikin! -1-

**Gelawêj EWRÎN**

Demeke kurte derbasî Rojavayê Kurdistanê bûme. Hema hatina min bi 6. Salvegera şoreşa 19 ê Tîrmehê rast hat. Şansek baş bû ku ez guhertinên vê şoreşê çêkirine carekedin bibîr bînim. Rastî pirtûka nivîskarê bi nav û deng ê Ereb Nizar Qebanî (1923 Şam-1998 London) ya bi navê Çîroka Jineke Xemsar hatim. Dibêjin Qebanî gelekî li ser jinan nivîsandiye. Ji ber vê yekê di cîhana Ereb de gelek rexne jî lê hatine kirine. Lê belê wî gelekî bi wêrekî behsa jinan kiriye. Rexneyên mirov bikin, hene bêguman. Lê bi rastî jî di xeyalên wî de her tim têkoşînek bi hêz a jinan li beramber pergala desthilatdar hebûye. Gilî û gazincan dike, hawarê dike û dixwaze jin xwe ji vê zilmê xilas bikin û bibin ya xwe. Di peyama wî de xwebûn gelekî heye. Dema min hesretên wî yên ku rojekê jin bibin ya xwe û civakê birêve bibin, dît, min got; Xweziya îro li vir bûya û berhemên şoreşa 19 ê Tîrmehê yan jî bi gotinek din şoreşa jinan bidîta. Çend roj beriya niha pirtûkên Nizar Qebanî bi Erebî û Kurdî li pêşengeha li Qamişlo dihat nîşandayîn. Xwezî ew jî li vir bûya û ji heyranên xwe re behsa pirtûkên xwe bikira. Yan jî ger sax bûya, dibe di derbarê jinên YPJ ê û têkoşîna jinên Kurd de gelek pirtûk nivîsandiba. Qebanî dibêje; ´Di cîhana Ereb de evîn wek kole û esîran e. Divê em azad bikin!´ Xwezî li vir bûya û biba şahidê têkoşîna jinên Ereb jî. Çawa şoreşa 19 ê Tîrmehê hişt ku jinên Ereb çarşevên reş di nava kolanan de bişewitînin û dawî li dîroka koletiyê bînin.

Di 7. Sala şoreşa 19 ê Tîrmehê de dema mirov li pêşketinên li herêmê mêze dike, asta têkoşîna jina Kurd mohra xwe li 100 salên dawî yên guhertinên li herêmê kir. Encama herî hêja ya vê şoreşê bêguman asta jin gihiştiyê ye. Tiştên Nizar Qebanî û gelek kesên din behsa wan dikin, jê gazincan dikin, rewşeke ji rêzê nîne. Koletiya Qebanî behsê dike xwe dispêre dîroka 5 hezar salî ya kolekirina jinê. Rêber Apo jî tam dest danî ser vê mijarê û got; Evîna Kurd hatiye kuştinê! Ev gotina Rêber Apo bingeha şoreşa jina Kurd e, em ji wê derkevin rê û bidomînin. Ger em ê behsa guhertina civakê bikin pêwîste asta koletî û azadiya jinê jî were zanîn û pênasekirin. Civak wek sîstema bedena mirov bi hevdu ve girêdayî ne û her guhertinek tevahiya civakê bandor dike. Ji hest û gotinên Nizar Qebanî û gelek zanayên li ser vê xakê jî diyar dibe ku her dem bendewariyek ji jinê hebûye ku li beramber zilma lê tê kirin, serî rabike. Civak pê hesiyaye ku ya li ser jin tê ferzkirin, ne cewhera heqîqî ya rabirdûya têr û tije ya me ye. Bi gelek rêbazan rûreşiya vê pergalê hatiye şermezarkirin. Di kilamên dengbêjî yên jinên Kurd de em pir bi hêsanî dikarin şopên vê rastiyê bibînin. Her jinekê li gel civaka xwe, bi awayekî serî rakiriye û koletî nepejirandiye. Belê raste, civak bi koletiyê hatiye terbiyekirin û gihandin, lê belê cewher ti caran xira nabe. Dema jinên Ereb çarşevên xwe di nava kolanên Minbicê de dişewitandin, gotina Rêber Apo ya digot; Jin wek civîkekê di qefesê de hatiye hepiskirin, ger rojekê derî vebe, wê bifire û heft welatan bibihore, bê ku pişt serê xwe mêze bike! Jinên Ereb piştî têkoşîna jina Kurd a li beramber hovîtiya DAIŞ ê bawer kirin ku ew jî dikarin ruh û bedena xwe azad bikin û bifirin. Ev yek bêguman tenê bi jinên Ereb re bi sînor nema. Çalakiyên bi milyonî yên jinan ji bo şermezarkirina siyasetên cinsiyetparêz ên Trump hestên hevpar ên jinan e.

# Peymana ku Kurdistan birîndar kir

**Yek ji êş û trajediyên ku Kurd dikişînin û heta niha bedewam dike encama Peymana Lozanê ye. Bi mor kirina Peymana Lozanê re li dijî Kurdan siyaseta qirkirinê ket meriyetê û pêrsgirêka kurd her çû kûr bû rê li ber gelek êş û eleman vekir. Hêzên komploger û navnetewî bi vê peymanê xwestin gelek armancên xwe di berdêla qurban kirina kurdan de pêk**

Kurdistan ku weke cografîk cara yekem di sala 1639'an di navbera împaratoriyên Osmanî û Safewî de hat du perçekerin, di 24'ê Tîrmehê sala 1923'an de bi Peymana Lozanê hat çar parçekirin.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Peymana Lozanê ya ku ji di dîroka Kurdistanê de û ji bo Kurdan xwedî trajediyeke mezin bû diyar kir ku bi îmzekirina Peymana Lozanê û îlana Komara Tirkiyê re qonaxeke nû dest pê kir. Ocalan wiha dibêje, "Aloziya Mûsil û Kerkûkê ya bi Ingilîzan re dewam dikir, hewl dan bi peymaneke gelekî trajîk a li dijî Kurdan bigihînin encamê."

Ocalan wiha dibêje, "Neteweparêziya Anatolyayê bi pêşengiya Mistefa Kemal weke tevgera rizgariyê bi gewde bû. Di vê de para rastiyê heye. Destpêkê isyaneke li dijî hêzên hegemonîk kiribû bingehê xwe. Di vê tevgerê de Kurd û Cihû bi rola damezrîner radibin. Tevî xwediyên erdan û eşrafên Kurd, sermayedar û kadroyên elît ên Cihû, bi hêmanên milliyetgir burokratîk ên Tirk re hevgirtin. Xiristiyan li derveyî vê hevgirtinê man û bi giranî bûn hedefa wê. Ev hevgirtin di qonaxa damezrandina Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê de dibe û di Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de tê pêkanîn. Di dema Şerê Rizgariya Neteweyî de (1919-1922) tê tengkirin û dewamkirin. Herçiqasî hin gumanên xwe hebin jî pirraniya rewşenbîr û eşrafên Kurd destekê didin vê hevgirtinê. Protokola Amasyayê, Kongreyên Erzirom û Sêwazê, pêkhênerên pêşî yên Meclîsa Tirkiyê vê hevgirtinê eşkere nîşan didin. Bi Qanûna Reforma Kurd a di 10'ê Adara 1922'an de ev hevgirtin tê xurtkirin. Bi îmzekirina Peymana Lozanê û îlana Komarê re qonaxeke nû dest pê dike. Arîşeya Mûsil û Kerkûkê ya bi Ingilîzan re dewam dikir, hewl dan bi peymaneke gelekî trajîk a li dijî Kurdan bigihînin encamê. Peymana Enqereyê ya bi Fransiyan re herçiqasî ji Mîsak-î Millî paşvegavavêtinek bû û hinekî jî li dijî Kurdan û Tirkmenên li Sûrî bi encam bûbe jî di asta felaketê de pêk nehatiye. Beşekî Kurdistanê ji Franseyê re hatiye hiştin. Lê ji ber neyêniyên wê yên li ser rastiya netewe ya Kurd divê mirov bi girîngî li ser raweste.

Li ser bingehê avakirina Iraqê Kurdistan hat parçekirin û ev bi awayekî eşkere binpêkirina Mîsaq-î Millî bû. Vê bûyerê li Parlementa Tirkiyê û di navbera Kurdan de rê li ber tengezariyeke mezin vekir. Ev peymana di 5'ê Hezîrana 1926'an de bi Ingilîzan re hatiye mohrkirin, gelek aliyên wê yên tarî hene. Şert e ku mirov vê peymanê weke destpêka dîroka qirkirina Kurdan binirxîne. Çawa ku tê zanîn, Mistefa Kemal di vê mijarê de jî gelekî tengav bûye û di warê hesabdayînê de ketiye zehmetiyê. Bi vê peymanê, dinamêt xistine bingehê lihevkirina dîrokî ya Kurd û Tirkan. Ya rastî, isyana sala 1925'an a bi serokatiya Şêx Seîd ji bo sergirtina vê xiyanetê hem hatiye provokekirin, hem jî bi awayekî gelekî bêmane bi xwînrijandin û bêrehm hatiye tepisandin. Di vê çarçoveyê de sala 1925'an, ne bi tenê isyan, bi awayekî rastî dema destpêkirina komplo, xiyanet û qirkirinê ye. Di vê de dîplomasiya Ingilîz û hêmanên Cihû bi rola diyarker rabûne. Çawa ku tê zanîn, di vê demê de ji ber ku Fethî Okyar gotiye "Ez destê xwe bi tevkujiya Kurdan nakim" ji serokwezîrtiyê hatiye xistin û li şûna wî Îsmet Înonî hatiye wezîfedarkirin. Fethî Okyar ji zarokatiya xwe ve hevalê Mistefa Kemal bû û herî zêde ji wî piştrast bû. Di dema ceribandina Firqeya Serbest de kengî hat dîtin ku serketiye, dîsa ji aliyê Îsmet Înonî ve hatiye xistin. Eşkere ye ku di van salan de bi tenê hêmanên Çepgir û Îslamî nayên tesfiyekirin, bi awayekî rastî yên weke netewe têne tesfiyekirin Kurd in. Wekî din, M. Kemal û koma wî gelekî bêhêz hatine hiştin. Ne ku komareke demokratîk, lê sîstemeke dîktator a tesfiyeker derdikeve holê."




## Em Lozan'ê dubare nekin



Qasim ENGÎN

19'ê Tirmeha 2012'da bi awayekî fermî Kurdên Rojavayê Kurdistanê şoreşa xwe îlan kirin. Her wiha şoreşa xwe bi gelê herêmê jî tacîdar kirin û niha jî xwe birêvedibin.

Pir balkêşe ku di gelek deverên cîhanê yên wek Rojava de, dema xweseriya xwe îlan dikin, -tevahî dewletên cîhanê nebin jî -piranî dewlet û hêz wan qebûl dikin. Lê mixabin tevî ku Kurdên Rojava ev 6 sal in ku şoreşa xwe ilan kirin e, hê jî him nehatine qebûl kirin, him jî êrîşên li ser wan -wek me li Efrînê dîtbênavber didomin.

Lê tişta herî zêde balkêş ewe kû, hêzên navnetewî li her dewletê zêdetir li hember erîşên dagirkeran li ser Kurdan bêdeng in û çavên xwe ji wan êrîşan re digirin. Mînak, 16'ê Cotmeh'ê Kerkûk e. Mînak, Efrîn'e.

Em êrîşên dewletên wek komara dagirker a tirkiyê û dagirkeriyên din jî fêmdikin. Lê em êrîşên dewletên qaşo xwe demokratîk dihesibînin hîç fêm nakin. Ji ber ku ew dewletên qaşo xwe demokratîk dihesibînin, gunehbarên rewşa Kurdan ên îro ne.

Em Lozan'ê bînin bîra xwe.

Kî mafên gelê Kurd, gelên Ermen û Suryan-Keldan firotibûn?

Kî ji bo berjiwendiyên xwe yên qirêj gelên herêmê radestî Osmaniyan û neviyên wan kirin?

Kî gelên ne misilman gurrkirin û pê re jî di rastê de ji komkujiyên tirkan re hiştin?

Kî bû sedem ku Kurd bi mîlyonan werin qetilkirin, mişextkirin, koçkirin, helandin? Di komkujîya çandî re werin derbaskirin?

Bersiv pir zelal e; dewletên Rojava, dewletên qaşo xwe wek cîhana demokratîk dihesibînin! Hê vekirî em bêjin, dewletên wek Îngîlîstan, Fransa, DYE û nokerên wan…

Çi bû Lozan?

Lozan di roja 24'ê Tîrmehê di sala 1923'an de, hatibû li darxistin. Di vê civînê da qala Kurdan hîç nekirin. Bi tevde Kurd hewaleyî tirkan hatibûnkirin û çarenûsa bi êş û elem wiha hat jiyandin.

Qaşo di civîna Sewrê de maf hatibû dayîn ku Kurd xwe bi xwe rêvebibin. Dîsa -ger bixwazin- dewletekê an jî rêveberiya xwe yên herêmî jî sazbikin.

Lê mixabin dema ku Tirkan bajarê Mûsulê ji bo Îngîlîstanê hiştin, Sewr ji nişkave hat ji bîr kirin û Kurd radestî Tirkan kirin. Komkujiyên ku piştre Tirkan pêşxestin re jî piştgirî dan. Ew parastin. Û ji bo avakirina dîktatorya Kemalîstan jî rê dan.

Ew sistema ku piştra wek sîstema "MÊTINGEHA NAVDEWLETÎ KURDISTAN" hat pênase kirin, di esasê xwe de wiha hat bi cîh kirin.

Di dîroka Kurdistanê de wan dewletên -bi taybet jî Îngîlîstan -rolekî pir xirab leyîstin. Niha jî xanima bi navê Theresa May heman rola qirêj dewirgirtiye û piştgiriya qetilkirina Kurdan û qatilê Kurdan Erdogan dike.

Wan tam beriya sad salî Kurd înkar kirin û neçar hiştin ku Kurd tam sed salî liberxwebidin, niha jî carek din dixwazin Kurdan neçar bihêlin ku Kurd carek din bi şerên pir giran re rûbirû bimînin.

Lê pêwîste herkes bizane ku, Kurd ne Kurdên berê ne. Ev yek. Ya duyem jî pêwîst e ku êdî Kurd jî wek berê tevnegerin, û pêwîst e -çi dibe bila bibe- Kurd xwe bikin yek. Hêzên xwe yên; leşkerî, dîplomatîk, siyasî û rêveberinê bikin yek ango dev ji berjewendiyên xwe yên biçûk û malbatî-eşîrtî berdin.

Em ji bîr nekin ku, tevî ewqasî tekoşîn û berxwedanên mezin hê jî metirsiya qirkirina li ser Kurdan wek sed sal berê didome. Bi hêviya ku îcar Kurd bibin yek da ku neçin yek bi yek…

## Divê hemû gel li Ocalan xwedî derkevin



Siyasetmedar Dr. Faîk Gulpî bal kişand tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û got, "hêzên desthilatdar ên naxwazin fikrên Ocalan belav bibin di tecrîdê de israr dikin, lê êdî fikrên Ocalan belav bûne û tecrîd ne çareserî ye."

Siyasetmedar Dr. Faîk Gulpî li ser tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin axivî.

### CPT ERKA XWE PÊK NAYNE

Gulpî bal kişand li ser rewşa Ocalan û diyar kir ku ji ber CPT bi dewleta Tirkiye û dewletên din ên desthilatdar ve girêdayî ye peywira xwe ya li dijî îşkenceyê pêk neanî. Dr. Gulpî bal kişand ser helwesta Tirkiye û hêzên desthilatdar û wiha got: "Tenê ne dewleta Tirkiye, dewletên desthilatdar hemû li dijî fikrên Ocalan in. Niha tecrîd di her alî de berdewam dike. Ev şermezariyek mezin e ji bo CPT û hemû saziyên parastina mafên mirovan ên Navneteweyî. Li gelek welatan Ocalan wekî zanyarekî mezin hatiye nasîn. Ji bo gel ji fikrên Ocalan sûdê negire, li ser Ocalan tecrîd giran kirine û didomîne."

Gulpî bal kişand ser bandora fikrên Ocalan ên li ser Rojhilata Navîn û wiha got: "Ji serdema sasaniyan heta niha tu kesî li Rojhilata navîn pirsgirêk çareser nekiriye. Lê Ocalan ji bo çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navin fikr pêş dixe. Heta niha fikrên wekî îslamê, lîberalîzmê pirsgirêkên rojhilata navîn çareser nekirin. Birêz Ocalan van fikran hemûyan dixwîne û ji nava wan tevan çareseriyek nû derdixe. Fikrên Ocalan ewe ku hemû gel di nava aştî û aramiyê de bijîn. Hewce ye gelên Rojhilata Navîn jî li Ocalan û fikrên wî xwedî derkevin. Divê hemû gelê Rojhilata Navîn zextan li ser Tirkiye bike da ku tecrîdê bi dawî bikin. Sedema tecrid û girtinê ewe ku gel ji fikrên Ocalan dûr bixe. Dixwazin ku fikrên Ocalan belav nebe. Lê beravajî vê yekê bi tecrid û girtina Ocalan re fikrên Ocalan bêtir belav bûn. Ji ber vê yekê jî ez bawer nakim ku tecrîdê berdewam bikin. Tecrîd naghêje encamê."

### TECRÎD NIKARE FIKRÊN OCALAN BI SÎNOR BIKE

Gulpî bal kişand terîda li ser Ocalan û wiha got: "Her dem hewldanên Ocalan ewe ku gelê Rojhilata navîn û cîhanê ji nava vî agirî derbixe. Hêj têgihiştina van fikran çênebûye û ji bo gel van fikran tênegêje desthilatdar vê yekê asteng dike. Dive em hemu ji derve bixebitin ku fikrên Ocalan ên ji zindanê derdikevin bigihînin hemû civakê. Ji ber serkeftina fikrên Ocalan girtin û binçavkirina siyasetmedarên kurd bandorek neyînî li ser hilbijartinê nekir û dîsa HDP'ê bend derbas kir. Derbaskirina benda hilbijartinê derbaskirina fikrên Ocalan e. Her dem fikrên Ocalan ji ber ketiye nava gelan e, tecrîd êdi dijmin serkeftî nake. Bi tecrîdê êdî dijmin bi ser nakeve. Ji ber ku êdî fikrên Ocalan belav bûne êdi tecrîd ne çareseri ye."…*MA*

## Hizba Komunîst bertek nîşanî dagirkeriya Tirk da

Berpirsê komîteya Mehelî Kerkûk ê Hizba Komunîst yê Iraqê dagirkeriya dewleta Tirkiyê şermezar kir û diyarkir ku divê Hikûmeta Iraqê bibe xwedî helwest û vê pirsgirêkê bi dewleta Tirk re çareser bike. Dagirkeriya dewleta Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistanê berdewame û roj bi roj artêşa Tirk dagirkeriyê berfireh dike. Li ser vê yekê berpirsê komîteya Mehelî yê Kerkûkê yê Hizba Komunîst yê Iraqê Reysan Hisên li hember dagirkeriya dewleta Tirk nerazîbûn nîşan da. Hisên diyar kir ku hatina hêzên Tirk di nava xaka Iraqê de , ne li gorî qanûnên navnetewî ye û wiha axivî; "Rê ji bo vî karê dewleta Tirk nehatiye dayîn, divê dewleta Tirk ji bo raya giştî, Neteweyên Yekbûyî û Meclisa Ewlehiya Navnetewî vê mijarê zelal bike. Pêwîste Hikûmeta Iraqê li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk helwesta xwe nîşan bide."

Hisên di dawiyê de diyar kir ku pêwîste Iraq bi rêya peywendiyê ji derve re vê pirsgirêkê li gel Tirkiyê çareser bike…

*ROJNEWS*





# Tevgera Azadî ji bo çareseriyê 5 xal pêşkêş kir

**Ev demeke li Iraqê çalakî û xwepêşandan tên lidarxistin. Desteya Rêveber a Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê têkildarî xwepêşandanên li Iraqê daxuyaniyek nivîskî belav kir. Tevgera Azadî ji bo çareseriya rewşa Iraqê 5 xal destnîşan kir û diyar kir ku yekane rêya çareseriyê jî pêkanîna daxwazên welatiyane.**



Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê ji bo çareseriya rewşa Iraqê 5 xal diyar kirin û diyar kir ku yekane rêya çareseriyê jî .pêkanîna daxwazên welatiyane

Desteya Rêveber a Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê têkildarî xwepêşandanên li Iraqê daxuyaniyek nivîskî belav kir û têde bal di.kişine ser 5 xalên ji bo çareseriyê

Tevgera Azadî 5 xalên ji bo çareseriya rewşa niha ya Iraqê diyar :kirin wiha ne

1-Kongreyek berfireh a niştîmanî bê lidarxistin. Tevahî aliyên siyasî, nûnerên pêkhate, çîn, baweriyan tevlî bibin û ser qonaxê guftûgo bikin. Nexşerêyek ji bo çareseriya di aliyê ewlehî, aborî û siyasî ya vê qonaxê de diyar .bikin

2-Dadgeh bi rolê xwe rabe. Dûr ji destwerdana hizbî, hemû ew kes û aliyên deste wan di dizîna serwert û jêderên welat de hene bên ce.zarkirin. Dest danin ser malê wan

3-Hêzên ewlehiyê ji hişmendiya taîfî û hizbî dûr bikevin. Hewl bidin di çarçoveya berjewendiyên giştî yên gel û niştîman de erkê .parastinê bikin

4-Nûnerê Neteweyên Yekbûyî (NY) li Iraqê hîn zêdetir bi rola xwe rabe û helwestên cidî bigire ji bo Iraq hîn zêdir nekeve .metirsiyê de

5-Erkê gelên Iraqê ye ji bo derbaskirina hişmendiya netewperestî û mezhebperestî, ji bo jiyana bi hev re ya demokrastîk û îradeya civakê xwe birêxistin bikin. Di çarçoveya projeyên stratejik ên demokratik de ji bo pêşeroja Iraqê .hewldan bikin

Hêjay gotinê ye ku zêdetirê 2 heftiyane li beşek zêde yê bajarên başûr û navenda Iraqê xwepêşandan dijî nebûna av, ceyran û xizmetguzariyê destpê kiriye. Her wiha yek ji armanca sereke ya xwepêşandanan jî .bidawîbûna gendeliyê ye

## Di xwepêşandanên de 13 kuştî, 729 birîndar



Li gorî rêjeya Komîsyona Mafên Mirovan a li Iraqê, dinava 2 hefteyan de di xwepêşandanan de 13 kes hatine kuştin û 729 kes jî birîndar .bûne

Di 8'ê Tîrmeha 2018'an de li parêzgeha Besra ya Iraqê bi armanca siyaseta aborî û nebûna xizmetguzariyê ya Hikûmeta Iraqê xwepêşandan destpê kirin. Piştî wê çalakî belavî Necef, Zukkar, Mîsan, Hille, Dîwaniye, hinek bajar û .taxên Bexdayê bû

Li tevî hemû hewldanên hikûmet û rayedaran jî xwepêşandan berdewam dikin. Li gorî rêjeya Komîsyona Mafê Mirovan ya li Iraqê, di nava 2 hefteyan de di xwepêşandanan de 13 kes hatine .kuştin û 729 kes jî birîndar bûne

Li ser vê yekê Endamê Komîsyona Mafê Mirovan yê li Iraqê, Fazil Xerawî daxuyaniyekê nivîskî belav kir. Di daxuyaniyê de rêjeya kuştî û birîndarên xwepêşandanan ya 2 .hefteyan hat eşkere kirin

Li gorî daxuyaniya komîsyonê di nava 2 hefteyan de, di xwepêşandanên Iraqê de 13 kes hatin kuştin û 729 kes jî birîndar bûne. Ji vane 460 birîndar ji hêzên Iraqê ne. Herwiha hat gotin ku di xwepêşandanan de 757 kes jî hatine binçav kirin û gelek ji wan di 2 .rojên dawî de hatine azad kirin

Herî dawî komîsyonê di daxuyaniya xwe ya nivîskî de da zanîn ku di encama xwepêşandanan de 91 .avahiyan zerer dîtine

Her wiha Desteya Mafê Mirovan ya Iraqê 19'ê Tîrmehê ragihandibû ku di xwepêşandanan de 12 kes hatine kuştin, 571 kes jî birîndar bûne. Di daxuyaniyê de hatibû gotin ku ji birîndaran 195 kes sivîlin, yên din jî hêzên ewlekariyêne. Li gorî heman daxuyaniyê di xwepêşandanan de 47 avahî hatine şewitandin; ji van avahiyan 18 jê saziyên dewletêne, 22 avahiyên partiyane û 7 jî yê gel in…*ROJNEWS*

## Tirkiye ber bi hilweşînê ve diçe




Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî diyar kir ku ya girîng ne .meclîs e, têkoşîn e

Hevserokê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Sezaî Temellî li gel parlamenterên HDP'ê li Wanê berê .xwe dan Agiriyê

Temellî anî ziman ku di bin şertê OHAL'ê de hilbijartina 24'ê Hezîranê bi her cûre dek û dolaban pêk hatiye û got: "Bi walî, qeymeqam, polîs û leşkerên xwe kampanyaya hilbijartinê bi rê ve birin. Bend danîn pêşiya me, lê me bi hev re hilweşand. Em ê li tax, kolan, kargeh û bajarên û li her deverê li dijî vê pergala OHAL'ê û faşîzmê ".têkoşîna xwe mezintir bikin

Temelî wiha dewam kir, "Em dengê gel in. Em ê li dijî faşîzmê vê têkoşînê bi hev re rêxistin bikin. Wekîlên me di navbera gel û parlamentoyê de pir in. Em ê li her deverê bi wekîlên xwe re rêxistinbûyînê bikin. Em ê li cem hemû mexdûrên vê pergalê cih bigirin û xebatên xwe yên rêxistinê bi rê ve bibin. Em ê ba hêzên demokrasiyê xebat û têkoşînê bikin. Em di rojên tarî de derbas dibin, ên vê parçe bikin jî em in. Em ê bi soza me daye cangoriyan û hêza me ji ".wan girtiye rêya xwe bidomînin

### EV WELAT BER BI HILWEŞANDINÊ VE DIÇE

Temellî bal kişand ser krîza aborî ya di rojevê de ye û got: "Krîzên aborî, siyasî û civakî hemû bi hevre tên jiyîn. Ev desthilatdar, ji ber hêrsa di desthilatdariyê de bimîne, ev welat ber bi hilweşînê ve bir. Weke ku hemû kes jî dizane dijminantiya gelê Kurd bingeha krîzan ava dike. Dawî li şer û xizantiyê anîn di destê me de ye. Em ê bi hev re têkoşîna aştî û demokrasiyê bilind bikin û bi ser bikevin. Em ê di serdema nû de jî bi bilindkirina têkoşînê vê ".desthilatdariyê ji holê rabikin

## Divê li dijî îdamê îradeyeke xurt hebe



Li dijî darvekirina Ramin Hisên Penahî li Silêmaniyê çalakiyek hat li dar xistin, di çalakiyê de birayê Ramin Hisên Penahî diyar kir ku ger li Rojhilatê Kurdistanê îradeyek netewî were avakirin, wê rejîma .Îranê nikaribe wê îradeya bişkîne

Çalakiyên li hember cezayê darvekirina Ramîn Hisên Penahî berdewam dikin. Bi vê boneyê roja 22'ê tîrmehê bi pêşengiya Desteya Parastina Zindaniyên Siyasî û kampanya "Na ji bo darvekirina Ramîn" li parka Nalî ya bajarê Silêmaniyê bi beşdariya hejmarek welatî, parlamenter û pêkhateyên din çalakiyek hat li dar xistin. Di çalakiyê de hat xwestin cezayê darvekirinê yê Ramîn Hisên Penahî û hemû girtiyên din yên siyasî were .xirakirin

Di çalakiyê de endamê Komeleya Zindaniyên Siyasî yê li Silêmaniyê Mihemed Pişder daxuyaniyek a çapemeniyê da û got; "Cezayê darvekirina girtiyên siyasî li Îran û hinek welatên din hê jî dewam dike, ev yek li dijî mafê mirovane. Em bang li rejîma Îranê dikin ku cezayê darvekirina Ramîn Hisên Penahî û hemû girtiyên din yên siyasî betal bike. Ger ev yek pêkwere wê ji bo rejîma Îranê di aliyê azadiyê de ".destpêkek erênî be

Piştî wê birayê Ramîn Hisên Penahî, Refîq Hisên Penahî jî axivî. Penahî destpêkê spasiya hemû kesên ku ji bo Ramîn Hisên Penahî dinava çalakiyan dene kir û wiha axivî; "Ger îradeyek netewî li Rojhilatê Kurdistanê pêkwere, wê Komara Îslamî ya Îranê nekare îradeya me bişkîne. Ragihandinên Başûrê Kurdistanê jî dikarin ji bo mafê parçeyên din hê zêdetir kar ".bikin

## Gefên Trûmp 'şerê psîkolojîk' e



Generalekî Îranî diyar kir ku gefên Serokê DYA Donald Trûmp ên bi rêya Twîtterê dixwe, beşek ji 'şerê .psîkolojîk' e

Li gorî ajansa nûçeyan a Îsnayê, generalê Îranê Hûlam Huseyîn Heypûr got, "Daxuyaniyên Trûmp ên li dijî Îranê dide, beşek ji şerê psîkolojîk e. Di rewşeke wiha de nîne ku li dijî Îranê bikeve nava liv ".û tevgerê

Heypûr îdîa kir ku gel û hêzên çekdar ên Îranê wê li dijî 'dijminan' rabin ser piyan û armancên xwe bi .ser bixînin

Şîroveya generalê Îranî piştî daxuyaniya Serokê DYA Donald Trûmp .a gef li Îranê dixwar, hate kirin

Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) Donald Trûmp bi rêya Twîtterê ji Serokkomarê Îranê Rûhanî re mesajek bi tîpên .mezin nivîsî

Peyama Trûmp wiha ye: "Ji Serokkomarê Îranê Rûhanî re: CAREKE DIN QET GEFÊ LI DYA NEXWE, NAXWE TU YÊ ENCAMÊN KU BERÊ DI DÎROKÊ DE HATIYE SERÊ KÊM MIROVAN, BIBÎNE. EM ÊDÎ NE WELATEKÎ WELÊ NE KU XWE LI GOTINÊN WE YÊN LI SER ŞÎDET Û MIRINÊ RABI-"GIRIN. HAY JI XWE HEBE

Rojek berê wê jî Serokkomarê Îranê Hesen Rûhanî daxuyaniyek dabû û ji Trûmp re gotibû, "Bi teriya şêr nelîzin." Rûhanî gotibû, eger êrîş li Îranê were kirin ev yek .wê bibe şerê herî giran

Aloziya navbera DYA û Îranê, piştî ku Trûmp meha Gulanê biryar da ku ji peymana nukleerî vekişe, giran bû. Ewropiyan, Rûsya û Çînê ragihandin ku wê li gorî peymana nukleerî ya bi Îranê re tevbigerin .ku sala 2015'an hatibû îmzekirin